

Welat

01/06/2016

Çandî - Giştî - Serhîwe

31

Li Amûdê

zarok di navbera agirê
peydakirina pariyê nan û
xwendinê de **dîşewitin.**



Wêne: Serdar Darî

Welat

PEYVA WELAT

Hîn xwedî li nivîskaran
dernketin e.

Aras Yûsiv

Tê bîra min carekê hevalekî bavê minî nivîskar ku ew ji Kurdên başûrê kurdistanê ye, ji Nemsayê hatibû seredana me li Qamişlo û karê wergerê ji zimanê Elmanî bo Kurdî û Erebbî dikir, di civatê de behsa helbestê hate kirin, wî kesî behs kir, ku li iyaleta ku ew lê dijî tevî mezinbûna wê tenê 5 helbestvan hene.

Piştî ez ji civatê derketim û hemî helbestvanên ku ez nas dikim an dostê bavê min bûn, min di bîra xwe de anîn, min nikarbû fêhm bikim çima hejmara helbestvanan li kolana me bi qasî hejmara yê li iyaleta hevalê bavê min in.

Belkî li wê iyaleta ku hevlê bavê min li Nemsayê lê dijiya û li gelek welatên Ewropî yan Emerîkî sedem hene ku hejmara helbestvanan hindik be, li rojavayê kurdistanê jî sedem hebûn ku hejmara bilind ji helbestvanan kêm bibe û di serî de rewşa çewisandin û bînpêkirina çanda kurdî û darizandina çî kesekî berehemek bi kurdî nivîsandiba, hikûmeta sûrî û muxaberatên wê li berhemên kurdî dinerîn mîna ku ew dijî min be û divê were girtin û kuştin, lewra ev berhem bi rengekî veşartî dihatin nivîsandin, çapkirin û belavkirin.

Berî ku şoerşa sûrî dest pê bike, bînpêkirina çanda kurdî û zordariya li ser çî kesê bi zimanê kurdî dinivîsîne sedem bûn di vî pîrsgirêkê de, lê aniha û di rewşa îroyîn de diravkirina pirtûkxaneyê kurdî ew tenê ya dikare rê bide nivîskarekî ku bibîne zimanê kurdî jî dikare bihêle ew bibe xwedî pirtûk eger pê nivîsand û dikare bihêhle ku pirtûkên wî têkevin şanogehan de û berî her tiştî ku berhemên wî mesrefa wî bo jiyanê xweş peyda bikin.

Gereke li ser saziyên çandî îro bi rola xwe rabin û bihêlin ku nivîskar, romannivîs, çîroknivîs, şanonivîs û lêkolîner... nema bi tiştê mijûl bihêlin ji bilî amadekirina berhemên xwe, û rê bidin wan ku wek

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Mihemed Zekî Mihemed
Hekîm Ehmed

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

her nivîskarekî li welatên pêşketî di riya berhemên xwe de karibe jiyana xwe bi asanî berdewam bike ne ku xema vî kesê nivîskar mesrefa mala wî be û pera deyn bike ta ku berhemên xwe çap bike.

Îro ev mijar tiştê gelekî hestiyar e û ji hemî saziyan tê xwestin ku karibin tiştê ji nivîskarên xwe re peyda bikin da em jî di dawiyê de karibin bihêlin pirtûkxaneyê kurdî dewlemend bibe û bihêlin ev berhem bighêjin cîhanê, da ew nas bike ku mîletê kurd mîletê xwedî çand û rewşenbîr û nivîskar e. Nivîskar neynik in ji mîletê xwe re li ber mîletên din... ka em jî derfetê bidin ku neynikên me hebin û jiyana mîletê me û xewnên wî bighînin wan.


ev buyer û û piştî bêtirî 10 salan ji bîra min naçe

Li her devereke ji dunayê nivîskar cihekî xweş di civaka xwe de digirin û ew wek nasnameya gelê xwe têne naskirin, neynikek ji jîyan û pêşeroja wan re têne xuyanêkirin, ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

Şoreşa Neqîşbendî .. Şêx Seîdê Pîranî.

Izedîn Salih



Şêxê Neqîşbendî, angî şêx Seîdê Pîran (1865an Xinûsa Erzîromê – 1925an Amedê)z,şoreşgerê Kurd û rayedarê şoreşke kurdî li dijî dagîrkerên Kurdistanê bû,ku ew şoreş bi navê şoreşa neqîşbendî angî şoreşa Şêx Seîdê Pîranî tê naskirin. Piştî rêkeftina Lozanê di sala 1923an de, bizavên Mîstefa Kemal Etatûrk yên eşkere li dijî Kurdan bo tunekirina hebûna Kurdî destpê kirin,hin Şoreşgerên Kurd di wê demê de wekû şêx Seîdê Pîranî,Kemal Fewzî,Yûsiv Zeya û Xalid Beg Cebrî tevgera azadiyê bi serokatiya Xalid Beg Cebrî damezirandin,ku armanca vê tevgerê rizgarkirin û serxwebûna Kurdistanê bû,lê Mîstefa Kemal Etatûrk bi xapînokên xwe dikarîbû serokê Tevgerê Xalid Beg Cebrî û hevalên wî Yûsiv Zeya û Hecî Mûsa Beg bigire û wan li Bedlîsê bidar veke,lewre Şêx Seîd neçar ma ku ew bi xwe pêşengiya tevgerê bike,bi heval û dostên xwe re amadebûna raperînekê li dijî kemaliştan bike ku di 13ê Reşmîyê ji sala 1925an de dengê fişeka yekem hat bihîştin û çirûska yekem ya raperîna Şêx Seîd berî dema xwe destpê kir û herêmine berfireh wekû Pîran,Hîn û Liçê tevî raperînê bûn.

Di 14ê Reşmîyê de Şêx Seîd û şoreşger derbasî bajarê Kincê bûn û waliyê bajar û hin berpirsyarên payebilind dîl girtin,herwiha şaredariya bajarê Darahînê rizgar kirin û dest danîn ser bajarên Madin,Kenc,Erxane û Siwêrekê û bi aliyê bajarê Amedê ve meşîyan,bajar li pey bajar ji destê dewleta Tirkîyê derxistin,êrîş ser bajarê Amedê kirin û bajar bi mehan ji aliyê şêx Seîd û şoreşgeran dorpêçkirî ma,dorpêçkirina li ser Amedê berdewam bû û şoreşger pêş ve diçûn û bajarê Elezîz ket destê wan,dewleta Tirkîyê heşt bi

metirsiyê kir û hin êlên Kurdan dan aliyê xwe û ew tevî artêşa xwe li dijî şoreşgeran kir,bi riya asmanî û bejayî jî artêşa Tirkîyê êrîşî şoreşgeran kir û ew veğerandin,herwiha bi sedema xinizîya hevlingê Şêx Seîd,Serdar Qasim «Qaso», Şêx Seîd û hin hevalên xwe di 27ê Nîsanê de bi xefkekê li nêzî bajarê Mûşê dîl hatin girtin û ew şandin bajarê Amedê.

Di 10ê Gulanê ji sala 1925an de,Şêx Seîd û hevalên wî derxistin dadgeha serxwebûnê ya rojhilatê Amedê,nêzîkî pênc rojan darizandina wan dirêj kir ku di 28ê Pûşperê ji sala 1925an de derbarê Şêx Seîd û 48 hevalên wî de dadgehê biryara darvekirinê da,di 30 Pûşperê ji sala 1925an de, Şêx Seîd û 48 hevalên xwe li taxa Deriyê Çiyê li Amedê hatin bidarvekirin,Şêx Seîd li hember werîsê qinarê di gotina xwe ya dawî de,ji gelê Kurd re wiha got: «Jiyana min ya xweza bi nêzîkî dawîya xwe ve diçe û ez qet ne poşman im,çaxa ku xwe dikim qurbanî di ber Gelê xwe de,em kêfxweş in ji ber ku neviyên me,wê ji me fedî nekin û serbilind bin li hember dijminan».



عندما يستقط الرئيس

جوان تتر

في

الثكنة العسكرية يغدو الزمن أطول وأنقى سيدي الرئيس!! هل تعلم هذا الأمر؟ وأيضاً في الثكنة العسكرية يغدو الوطن لعبة لتزجية الوقت وشيئاً معكراً لصفو التذكر البعيد، أجل سيدي الرئيس،

في المهجع الطويل يصرخ (محمد): « في تل كلخ ثمة مهربون كثير، عندما ستسقط يا سيدي الرئيس سوف أصنع كتيبة للمهربين، سنهرب كل شيء، حتى أحلامنا يا سيدي الرئيس، شكراً لك على أية حال!! »

سيدي الرئيس، كانت تمارين الرياضة خاطئة وأيضاً الجري كان مُتعباً، هل تعلم ذلك؟ وعندما ستسقط سيكون كل شيء على ما يُرام، سنبنّي ثكنات جديدة ومكيّفة حتى نستطيع الدفاع عن وطننا صيفاً وعند حلول الشتاء، عندما ستسقط سنسمح للجندى الحزين أن يدخل بشاره في نوبات الحراسة، سنفهمه أن لا أعداء لنا يطلقون الرصاص من القناص لمجرد الإتيان بحركة ما غير صحيحة، وعندما ستسقط يا سيدي الرئيس ستكون لدينا حصص كثيرة عن الرسم والكتابة أثناء خدمة العلم التي ستتغير بكل تأكيد.

كل ما يدور في ذهن الجندي المستلقي على سرير ملوث في نهاية المهجع الآن هو أن تسقط يا سيدي الرئيس، كي يتسنى له أن يتذكر بيسر كل الغائبين.


سنسمح للأطفال أن يلعبوا ويمرحوا في ساحات التدريب، سنقول لهم: « انظروا ملياً، هنا عاقبتنا الضابط لأن أحدهم سعل فجأة، العبوا أنتم الأحرار الآن!! ».

هل سنبنّي تماثيل مجدداً؟ تقول الطفلة لوالدها المستلقي على الأريكة، يبكي:

— سنبنّي أنفسنا دونك سيدي الرئيس!! ■



Bira Kujî



عندما يصبح الوطن يتيماً في شوارع الغربة ..!

حسن حسين

خمس سنوات، لم تكن كافيةً لغرس الخنجر المسموم في خاصرة وطني الجريح، بل زادت من وتيرة الرعب ومعانقة الموت الأحمر القاتم ليكون عنواناً لكل يوم مجهول، هكذا مرّت الحياة طيلة أعوام، تشردّ وقتل ودمار، زوال معنى الإنسانية من قواميس الحيتان التي تبتلع المعاني على اختلاف ألوانها وكيونتها، ذاق الأطفال الويلات من جحيم الحرمان والتمتع بأبسط حقوق الطفولة، فقد أصبحوا كورود ذابلة تحت الركام، مبتوري اليدين أو الرجلين أو يتامى بلا أحد الوالدين أو كليهما.

حين تحوّلت الثورة السورية السلمية إلى مسلّحة، أفرزت ذلك الشرخ بين الأطراف السياسية والمجتمعية المختلفة، خاصّة في المناطق الكردية من حيث رؤيتها مدى نجاح الثورة السورية، حيث انقسمت إلى ثلاثة أطراف تتنازع سياسياً مع نسيان آمال الشباب في الحفاظ على وحدتهم، لم يتمّ تحرير الحزبيين من ثقافة التبعية والتصفيق، فازدادت حالة

التنافر والتناحر والتنافس، ليكون نتاجها اندلاع زوبعة الانشقاقات المعروفة خلال مسيرة هذه الحركة.

ثقافة التخوين و التجريح، هي ثقافة موروثية في تاريخ أحزاب بعيدة عن النزاهة و الأخلاق، ولا ينبع التخوين من حقل الوطنية وإنما يصبّ في مصلحة أعداء القضية، حيث كلاسيكية النضال ضمن هذه الأحزاب وتنظيماتها تفرز عوامل سلبية أكثر من الإيجابية، يُمارَس ذلك من خلال السلطوية أو الجهل في التعامل مع هذه المعطيات المهمة، بغية عرقلة تطوير العمل الحزبي وأداء الكوادر وعدم زيادة الوعي المعرفي لخدمة القضية الكردية من جميع النواحي، فأبّى خطوة للأمام تشكّل خطراً على مستقبل أصحاب الكراسي الفضفاضة، وتمثّل إنهاءً لدورهم، فيلجؤون لوضع العصي في العجلات وإفشال الجهود الرامية في أيّ تغيير للصورة القديمة المشوهة بأخرى نضالية حديثة تهدف لربطها بعجلة التقدم للوصول بها إلى درجات عليا من النضال.

بقي هذا الوطن غريباً في شوارع الغربة، ينتظر إشراقه شمس أخرى للخلاص من دكتاتورية بغیضة تمارسها كافة الجهات المتحاربة التي تتعاون مع الأطراف الخارجية للنيل من حقوق الشعب السوري في حرّيته وكرامة عيشه في وطنه، المواطن السوري أصبح جائعاً وبلا مأوى في شوارع غريبة وها هو الموت يلاحقه في كلّ لحظة وكلّ خطوة. ■





Li ser kê bigirîm?

Serdar Keleş

Cî di laş de nema ji kul û derdan
 ku ez bigrîm hevalê min
 Dil û hiş hatin sotin ji talanê
 ji kuştinê, welatê min
 Ma li ser kê bigrîm, mam bihiştî?
 hêstir nema li vî canê min
 Ma ev çi narvîn bû, roj tarî bû?
 bê serî bû, hat pêşiya min
 Ma ev çi bahoz bû, gewr û boz bû?
 wêran kir hemû warê min
 Ma ev çi qeder bû ma li pey min?
 armanca wê bû, kuştina min
 Qîrînek ji dil bang dikim: Bes e
 koletî, hey koledarê min
 Dijmin dîsa dixwazin bişewtînin
 birevînin hemî xewnên min
 Koç bar kirin, talan kirin
 vale kirin hemû gund û şarê min
 Dîrok û roman rawestîyan
 çima vale kirin welatê min?
 Ma raştîyê çima xwe veşartîye?
 wê kengî dê bersiva min
 Qey dîse fermana me kurda ye?
 kes napirse li rewşa min
 Ma li ser kê bigrîm hey dîrok?
 dîse tu dinivîsî janên min
 Ma ka dadgeha li ser raştîyê
 ku biryarê bide dadwerê min. ■

Ji her malikê tîpa yekem.

Ronîstêr Mîrza.

Rewîştberz e ramûsekî,bo mi bexşînî.

Omêda min bi ramûsan,min biherşînî.

Nîşana dilsoziyê ye,lêvan rûşînî.

Îskana jînê gel min,her binoşînê.

Sewziya evînê dilber,reş nepoşînî.

Taponameya pêşîran,bo min bişînî.

Êvarbaş û fermoyînê,lê binexşînî.

Rêga jiyana herdemî,çima reşbîn î.

Jan û derdan vemale,ev dil herdem bo te ye.

Inca xweşya jiyanê,dilekî nûkate ye.

Tûşî yek her dem bibin,gewd jî bibin yek parçe.

Ez û te li cîhanê,gul bîm tu jî şîn-baxçe.

Hezar dike fîxan,bo vî dilê reben.

Ejder in derdê min,bi sedan tarz û fen

Zanişta evînê,ew e awir û ken.

Dexel in biskên te,wiha jî lêv û çen.

Iqbala xemgîn im,tu Îştar û rewşen.

Kuştin bi lêvên te,ew e mirna resen.

Eve ye eşqa min,bo min ev e deydên.

Keya bi teysîn û tac,maçek li te heye bac.

Baca hindik û wala,rûnaxîne tu mala.

Mal maye sar û bêtên,janên te li min hiltên.

Hiltên û bûne asê,têr nabim ji vê tasê.

Ger tenê bimîne l' jînê, dê hez bikim ji te dînê. ■

Nirxê peran li Bajarê Dirbêsiyê

Hisên El Sîno

8

Rewş li bajarê Dirbêsiyê her diçe xerabtir dibe, bi taybetî rewşa aborî ya ku rewşa herî girîng e, Sedema wê jî, şoreşa Sûryê y, Ku em dikarin wê niha bêjin, ku krîza Sûryê, û Felaketa ku li welat çêbû, bandora xwe ji hemî aliyan veli herêmê kir, bi taybetî jî Dirbêsiyê, Di vê raporê de emê li ser pereyan û buhayê zêr li bazara bajarê Dirbêsiyê baxivin, Ku bûye parek mezin ji jiyana welatiyan, ku deqqe be deqqe dide pey nûçeyên wê.

Ji beriya destpêka şoreşa rûmet û azadiy li Sûriyê pêkekve, nêrxê perên (xerîb) ne xirab bû, ku dolar ji 45 ta 47 (L.S) di hate firotin, anga her dolarek be 45 ta 47 lîreyên sûrî bû. Lê belê şerê li Sûriyê qewimî, Buhayê giha radeyeke bilind û ji hişder.

Eger Dolar an Yoro û zêr roj bi roj gelekî bilind dibe, beramberî wê nêrxê lîreya sûrî ya herî kêr û nîzim dibe. Ev nîzmibûn bandorê li jiyana welatiyan dike, bi taybetî jî yên ku dolar ji derve re ji bo zarokên xwe bişîne, bi taybetî yên ku xwendekarên li derveyî welêt hebin, piri zehmet û dijwar e, ev ji aliyekî, Lê belê li aliyê din jî, welatiyên ku di bajêr de yên ku pere ji wan re ji derve re tên wek (dolar - yoro) sûdeke mezin jê tê wergirtin, Ji ber ku nêrxên wan bilinde li hemberî lîreya Sûrî, ye Sûriyê, Tevî vî yekê jî rewş dijwar e buhabûneke bê sînor û hevsar di herêmê de ye, Lê belê şandina dolar ji derve

gelek çêtir e.

Korsê pereyan her diçe bilindtir dibe, wek ku krîza dereng e, û di berdewam kirina xwe de, zehmetî ji bo welatiyên bajarê Dirbêsiyê çê dibe, bê guman welatî wê nikeribin jiyana xwe di bajêr de berdewam bikin, û ji bilî koçberiyê tu rê li pêşiya wan tune ye.

Di dawiyê de emê nêrxên pereyên bianî li hemberî lîreya Sûrî buhayê di vê meha dawî de diyar bikin:

Dollar: Firotin 603 (l.s) - kîrrîn 606 (l.s)

Yoro: Firotin 665 (l.s) - kîrrîn 670 (l.s)

Lira Tirkîyê: Firotin 200 (l.s) - kîrrîn 203 (l.s)

zêr: 20400 (l.s). ■

Li Dêrikê, Navenda pêşxistina malbatê.

Umer Ehmed



Di rewşên awarte de gelek tişt derbasî jiyan û civaka gelan dibin, yek ji van tiştan ku gelek sazî û rêxistin çêdibin û bandoreke baş li civakê dikin, yek ji van saziyan (**Navenda pêşxistina malbatê**) .

Li ser vê mijarê **Wenda Mihemed** rêvebera navendê ji kovara Welat re wiha axivî û got: Me dest bi karê xwe kir piştî ku me lêkolîn dinav civakê de çê kir û me dît ku gelek mabat hene dûrî civakê ketine û zarok dûrî dibistanan ketine û jinê me dûrî civaka xwe ne .

Me dît ku pêwîstiya gelê me bi wek vê navendê heye .

Ev navend bi şaredariya dêrikê û bi taybetî navenda jinê ve girêdayî ye û ji bo vê navendê pêwendiya me bi saziya parastina zarokan re heye.

Di 8ê avdara 2016 an me ev navenda vekir û du kesa de dest bi perwerdê kir . Temenê jinê ku tên perwerdê ji 18 salî ta 45 salî û zarok ji 6-18 salî yê ku dûrî dibistanê ketin e .

Li gorî temenê zarokan me ew li girûpan belav kirin û wan fêrî mûzîk û çêkirina

wênayan dikin .

Me gelek semînar li ser civaka sivîl ji jinana re pêşkêş kirin û hemo biranş hene û mamostê me jî mamostene, di warî mafnasî û zanîsta civakê de pispore in .

Em gelek caran ji dadgehê dadyaran tînin . her roj sîmînerekê pêşkêş dikin ev bername wê ta 2-6-2016 an berdewam bike, pişt re emê perwerdeyeke din dest bê bikin, her tiştî em bê pere didin .

GELO: Wek ez dizanim ku ne tenê xwarin û vexwarin jiyan mirovan xweş û geş dike û ne tenê enternê pêwendiyên çêdike, lê divê di civakê de her reng û her tişt hebe ta em van neyniyên ku derbasî civaka me bûne careser bikin ■





أن تقوم بإجراءات تحدّ من هذه الظاهرة ولكنها إجراءات خجولة ولن تتطور إلا بتضافر الجهود والمحاولة بشكل موحد الوقوف على هذه الظاهرة والقضاء عليها، كما أنّ محاولات الإعلام الكردي المحلي في المنطقة تساهم بعض الأحيان من التنبيه على خطورة التسرّب الدراسي ومالها من نتائج على مستقبل المنطقة، لأنّ النهاية ستكون خلق جيل غير مسلّح بالعلم، وفقد القدرة على السيطرة على التغيرات التي تطرأ من كل الجوانب. ■

ويعمل في أعمال لا تليق بسنّه إلى نسبة ٢٥٪، ويقول مهتمون أنّ الأوضاع المعيشية في طريقها إلى التردّي أكثر بسبب فقدان العملية التربوية والتعليمية إلى رونقها القديم والتنظيم السابق، أو على الأقلّ الأسباب المحرّضة التي كانت تدفع بالمواطنين إلى التعلّم، عدا عن الأمور الأخرى، فاضطرار الطلاب إلى ترك الدراسة والتفرّغ التام للعمل ينتج جيلاً متخلفاً عن ركب التطور الذي يأتي من خلال التعليم.

أمور أخرى كانت السبب الرئيسي في ازدياد نسبة التسبب الدراسي منها عدم فعاليّة بعض المنظمات المدنية التي لا تقوم بواجباتها أو تأمين فرص تعليمية لطلبة في ظلّ الأوضاع المعيشيّة المتردّية.

- طرق وحلول :

يقول أحد المواطنين: «أنا مجبر على جعل ولدي الوحيد أن يعمل، لأنّ الأوضاع الاقتصادية باتت سيئة وليس هناك مجال لأن يلتحق ابني بالمدرسة لكي يتعلّم، إضافة إلى أن التعليم لم يعد يجدي في سوريا بشكل عام وفي المناطق الكردية بشكل خاص بسبب الفوضى الحاصلة والنزاعات العسكرية وظهور تجار الأزمة الذين يحاولون قدر الإمكان القضاء على المستقبل بشتّى الوسائل»، وعلى الطرف الآخر تحاول بعض الجهات وخاصة هيئات التربية والتعليم التابعة للإدارة الذاتية



عامودا، التسرب الدراسي آفاق مسدودة

جان تر



تعتبر مدينة عامودا من أقدم مدن روج آفا من ناحية البناء ووجود المدارس فيها، وتعرضت المدينة إلى موجات هجرة عديدة في السنوات التي سبقت الثورة السورية، وكان الوضع التعليمي فيها جيداً على الرغم من صغر مساحتها وقلة عدد سكانها، لكن بعد اندلاع الثورة في سوريا ووصول شرارتها إلى مدينة عامودا بدأت الهجرة تزداد كثيراً بسبب الأوضاع وقلة فرص العمل، وبالتالي التأثير على الوضع التعليمي، كما أن العديد من أهالي المدينة توجهوا نحو قامشلو للعيش فيها، على الرغم من أن مدينة عامودا تعتبر منطقة آمنة إلا أن سبل العيش فيها تتقلص يوماً إثر يوم لأسباب عديدة، لعل أهمها فقدان العمل والبحث من قبل المواطنين عن أعمال أخرى ترفع من سوّية عيشهم المتردي، وهذه الأسباب كان لها التأثير القوي على المستوى الدراسي والتعليمي.

- ظروف قاهرة :

يقول المعلم «أمجد حسو» لمجلة ولات : «أسباب كثيرة دفعت الطلبة إلى هجر الدراسة لعل أهمها الأسباب الاقتصادية واختلاط المناهج وعدم وضوحها والصراعات السياسيّة حول المناهج، إضافة إلى نشوء أكثر من مدرسة وأكثر من منهاج، الأمر الذي دفع

الأهالي إلى سحب الأبناء من المدارس»، وعن التسبب الدراسي يكمل أيضاً: «الظروف المعيشية هي أحد الأسباب الرئيسية التي جعلت الجو العام يبدو ضبابياً لكل شيء وليس فقط بالنسبة للوضع التعليمي، ولكن للأسف الشديد أكثر المتضررين من هذه الحرب وهذه الأوضاع هم الطلبة» وعن نسبة التسبب الدراسي يتابع: «لا يمكن تحديد نسب التسبب الدراسي بدقة شديدة، كون الخطوات التنفيذية والإحصائية لا زالت ضبابية لدى الهيئات المختصة التابعة للإدارة الذاتية، بالإضافة إلى ضعف دور وفعاليات منظمات المجتمع المدني التي لا تقوم بالدور الموكل إليها من خلال التركيز على جودة التعليم وفصل الطلبة عن الأوضاع السياسيّة»

- نسب التسبب :

يمكن تقسيم أسباب التسبب حسب النسب المئوية إلى عدّة حالات، فالوضع المعيشي يأتي في الدرجة الأولى وتصل نسبة سبب ترك الدراسة والتسبب من المدارس لأوضاع اقتصادية معيشية إلى الـ ٧٥٪، بينما تحتل أسباب هجرة أحد الوالدين وتفرغ الطالب للعمل لكي يعين أسرته



جامعة عفرين بين تحقيق الحلم وخياب الاعتراف

أياندا كوران

عميد الكلية للشؤون الإدارية.

الدكتور عدنان يعقوب قال في حديث خاص لمجلة ولات: في ظل الظروف الحالية التي تمرّ بها سوريا عامّة ومنطقتنا خاصّة، كان لا بدّ من إيجاد البدائل في جميع النواحي، وأمام مشكلة التعليم وعدم تمكن شبابنا من إكمال دراستهم بسبب ظروف الحرب كان لا بدّ من افتتاح جامعة تستوعب الجيل ومتابعة التطوّر العلمي والتقني، وهذا ما أخذناه في الجامعة على عاتقنا. أمّا عن تجربتي الخاصة منذ الافتتاح وحتى الآن، أستطيع القول بأننا حققنا الكثير، خاصّة في قسم الأدب الكردي، ووجدنا بذلك ضرورة افتتاح مجالات أخرى عدا الأقسام الثلاثة لاستيعاب أكبر عدد ممكن من الطلبة في المرحلة ما بعد الثانوية.

أما في لقاءاتنا مع الطلاب في الجامعة، قال أحمد شفيق أحد طلاب كلية الإقتصاد: كنت أفكر في السفر إلى مدينة غازي عنتاب التركية كي أكمل دراستي، فظروف الحرب الدائرة في البلاد جعلتني أضطرّ إلى إيقاف تعليمي الجامعي في محافظة حلب لمُدّة أربع سنوات منذ بداية تأزّم الأوضاع في حلب وعودتي إلى مدينتي عفرين، وعندما علمت أنّ هناك مشروع لافتتاح جامعة لأبناء عفرين الذين حرّموا من إتمام تعليمهم، ألغيتي على الفور فكرة السفر وقمت بالتسجيل في قسم الإقتصاد. قال لي الكثيرون ولا زالوا يقولون أنّني أقوم بإضاعة وقتي وهدر مستقبلي في هذه الجامعة لأنّها ليست معترف بها بعد من قبل الأطراف المعنية، لكنني واثق أنّ لجامعتنا مستقبل سيجعله من أحد أهمّ الجامعات.

أما روكان بيرو إحدى طالبات الأدب الكردي تقول: أعتبر دخولي لجامعة عفرين وخاصّة فرع الأدب الكردي فرصة كبيرة لي، فمنذ الأزل كنّا نحلم أن تكون لغتنا الكردية على هذا القدر من الانتشار ويكون لدينا الحقّ والحرية في تعلّمها.

كما ويحلم أبناء مدينة عفرين أن يعترف بجامعتهم، وأن تتمكّن هذه الجامعة من فتح كلّ الأفرع اللازمة في المستقبل القريب علّها تحدّ من ظاهرة هجرة الشباب إلى الخارج بقصد التعليم والدراسة، فمدينتهم جميلة وتستحقّ أن تبقى مزدهرة بشبابها وشاباتاتها، ويكون لعفرين جيل من الأبناء المثقّفين والمتعلّمين، يعملون لتنمية الحياة فيها ويسهمون في رفع اسم مدينتهم عاليًا، كما يتمنّى الكرد أن يشهدوا جامعات في قامشلو وكوباني وكلّ المناطق الكردية

لطالما كان الكرد يحلمون بأن تكون لهم جامعة خاصة بهم، تحمل اسم إحدى مناطقهم في سوريا، لكن كما يقول الشابي: إذا الشعب يوماً أراد الحياة فلا بدّ أن يستجيب القدر، فالكرد عبر تاريخهم المليء بالآلام لم يعرفوا الاستسلام، واليوم تحقّق الحلم وافتتحت جامعة باسم عفرين وفي مدينة عفرين، ففي 26 / 10 / 2015 تمّ الافتتاح بجهود مجموعة من الدكاترة المحاضرين والحاصلين على شهادات في الدراسات العليا من الجامعات السورية، ممّن كانت لديهم فكرة وحلم تأسيس جامعة في عفرين، وبالفعل كان لهم ما يتمنّون.

في البداية عرض المشروع على المجلس التنفيذي في مقاطعة عفرين، وتمّت دراسته والموافقة عليه وفق المرسوم رقم 573 بتاريخ 14 / 10 / 2016، ويتألّف الجهاز التدريسي في الجامعة من كوادر محليّة مختصّة من أبناء منطقة عفرين.

الأقسام التي تمّ افتتاحها في الجامعة عند تأسيسها، هي كليات الإقتصاد والهندسة / قسم الهندسة الكهروميكانيكية / والآداب / قسم الأدب الكردي، ويبلغ العدد الإجمالي للطلاب والطالبات في الكليات المذكورة حوالي 250 طالباً أغلبهم في قسم اللغة الكردية.

تبحث الجامعة حالياً إمكانيّة افتتاح أفرع أخرى لها في المستقبل حيث تمّ إقرار افتتاح قسم جديد في كلية الهندسة وهو قسم الهندسة الزراعية.

ومن أهمّ هؤلاء المحاضرين في جامعة عفرين: د. أحمد يوسف، وهو من أهمّ من درّس الإقتصاد، وكانت له بصمة واضحة ومهمّة جدّاً في مجال الإقتصاد في منطقتنا، كما أنّه يتولّى مهمّتي رئيس الجامعة وعميد كلية الإقتصاد.

د. عبد المجيد شيخو، حاصل على شهادة الدكتوراة في فلسفة الآداب من قسم الصحافة والإعلام، وكم يفتخر أبناء عفرين بهذا المبدع، ككاتب وشاعر ودراس لتاريخ الكرد، إنّه من الأشخاص الذين عرفوا البلاد الأوروبية بالكرد وتاريخهم، هو الآن عميد لكلية الآداب في الجامعة. ولا ننسى أسماء المحاضرين الأكرام د. عدنان يعقوب عميد كلية الهندسة، ود. نورستان ممو نائبة



Girkê Legê, aloziyên jiyane.

Faxir Ebdela.

Ev demeke ku şênîyên Girkê Legê di astengiyeke dijawar de derbas dibin, bi aloziyeke mezin jiyana xwe dibûrînin, nemaze piştî nizmibûna lîreya Sûrî beramberî nîrxê Dolarê Emrîkî, û buabûna nîrxên hemî pêdivî û kel û pelên jiyane. Bi rastî, ji hêla welatiyan ve ev rewş bûye cihê metirsiyê, çimkî ev demeke ku şînayî nayê herêmê û pêdiviyên ku peyda dibin jî, pir buha ne, ji bilî vê jî tiştên din yên rojane gelekî buhagiranin û ya herî girîng divî warî de ku ev herêm bi çandiniyê navdar e, lê nîrxên berhenên çandiniyê li gorî wan salan bûrî pir erzan e. Derbarî vê mijarê kovara Welat nerîna hin welatiyan şopand.

Mihemed Tahir weha ji kovara Welat re axivî: "Bi rastî em jiyana xwe bi zehmetî derbas dikin, ji ber ku hemû tişt buha bûne, îdî em nema dikarin nîvê berê bijîn, hema ezê bi kurtayî ji we

re bêjim, mirov ji mecbûrî goştê mirîşkan dixwe bi xwedê ew jî buha bûye".

Ebdil Kerîm xwediyê firoşgehekê ye ji Welat re diyar kir: Ev nebûye hal bi vê rewşê re, tiştên em îro em difroşin roj din em bi buhayê me firofî dikirin, ev yek bandora xwe li me û welatiyan dike, û dibe cihê gazinên welatiyan ji me û buhabûna nîrxên kel û pelan.

Se'îd morovekî karker e, bi dilekî birîndar ji Welat re axivî: "Bi xwedê ez nema dikarim zarokên xwe têr xwarin bikim, weke tu dibînê ez bi bêr û qazme dixebitim, roja ku kar tune be xweş bawer be wê nanê me jî tune be. Vêce eger rewş bi vî rengî berdewam be, divê em ji xwe re bi cihekî dî de bazdin."

Helîma pîrejineke weha bersiv da: Erê kurê min, bi xwedê tiştê ku me nedîtî jî me dît xweska bi berê û rezîliya wê demê, em nema zanin çibikin hema weke yê gotî bihêle bi hêviya xwedê ve.

Çavê welatiyan li hêviyekê ye ku ev rewş bi hêsanî derbas bibe, hêviya me jî ew e ku ev rewş di deke nêzîk de li seranserî deverê çareser bibe. ■



Kampaniya Paqijkirina Qenala Avdanê li Dawidiyê

Salar Salih

Tevî ku êşên cengê li vî welatî yên herî xembar in, dûvre diwariya jiyanê û zehmetiyên peydakirina pêdiviyên rojane tê, lê li vir û wir dîmenin din jî hene, dîsa encama vê rewşê ne, dîsa sedema xemgînî û nexweşiyê ne, lê divê destên dermanker û êşkuj jî peyda bibin.

Komela Hesekê ya xêrxwaziyê, dest bi projeya paqijkirina qenala avdanê ya li gundê Dawidiyê yê girêdayî bajarê Hesekê kir, projeya paqijkirinê

di roja şemiyê, 2 ê meha Nîsanê de, destpê kir, proje wê bîst rojan berdewam bike, mebesta sereke ji vî karî re, rakirina gemara ku di qenalê de kombûye, bi armanca dîrxistina mêşên ziyandar yên ku nexweşiyên li nav gundê Dawidiyê vediguhêzin.

Mehmûd Es'ed yek ji nişteciyên gundê Dawidiyê ji kovara Welat re axivî:

Ew gemara ku di qenala avdanê de kom dibû, mêşa qûmê bi xwe re tanî, ewê mêşê, nemaze di demsala havînê de, nexweşiya (Laşmánya) li gund belav dikir.

Ji bo agahiyên bêhtir li ser vê projeyê, Aras Reşik endamê komîta birêveber a komela Hesekê, li ser vê projeyê ji kovara Welat re got: Armanca sereke ji vê projeyê, paqijkirina qenalê ji gemara kombûyî bû, herweha ev proje sûdeyê dighîne xêzanên karkerên ku tê de kar dikin, ji ber ku hejmara karkeran di projeyê de 60 karker e, ew di rojê de 6 demjimêran beramberî 3000 lîreyên sûrî kar dikin, proje 20 rojan berdewam dike û ev armanca diwem bû ji projeya me re, ku em karibin 60 kesê hejar di vê projeyê de

14



04 02 2016



bicî bikin û qezenca abûrî jê werbigirin.

Herweha Salih Hesên serokê komela Hesekê ya xêrxwaziyê, li ser giringiya vê projeyê, ji kovara me re axivî û got:

Armanca me ya sereke ji vê projeyê ew bû, paqijkirina hundirê qenala avdanê ji gemar û zibala ku tê de hatibû komkirin û veguheztina van paşmayan bo deverê dîrî gund, ji ber ku mîşên pîs xwe li vê zibalê digirtin û di encamê de gelek nexweşî li nav nişteciyên gundê Dawidiyê belav dibûn, yek ji wan nexweşiyên Laşmanyayê bû ku bi encama pêvedana mîşê çêdibe, ku pizika li laş derdikeve, şûna xwe kûr dihele, li ba welatiyan ev cihê metirsiyê bû, herweha Salih got ku armanca me ya din ew bû ku em di berdewaniya 20 rojan de, derfetên kar bo 60 karkerî dabîn bikin, ev jî bû weke alîkariyekê bi kesên hejar re li vî gundî.

Hin ji nişteciyên gundê Dawidiyê bi erênî ev proje nîrxandin û gotin ku ev proje di xizmeta gund de ye, nemaze ku gemara kombûyî gelek nexweşî çêdikin.

Wekû tê zanîn gundê Dawidiyê ji gundewarê bajarê Hesekê ye, 12 km an dîrî bajarê Hesekê ye, dikeve hêla bakur. ■



Jina gundî bê beng maye.

Sîmav Hesen.

"**R**oja min bi şerê hevjinê min û dengê wî yê bilind destpê dike, taştîya wî û zarokên xwe çêdikim, ew pê re diçin kar li kargeheke avakirinê li derveyî gund, ma ez dikarim çi bikim?" Newroza gundî, ku şûna êşa jiyana wê li gel şûna lêxistinê li ser rûyê wê xuya ye, wisa dibêje... kevala xwezayî bi destê mêrekî hatiye xirakirin ..Newroz dipirse: "Ez mafê xwe ji kê bixwazim?"

Piştî şoreşa Sûryayê, rêxistinên civaka sivil yên ku di warê mafê jinê de kar dikin, gelekî belav bûn, lê encamên karê wan ne li hemû deverê xuya bûn, hin dibînin ku sedem ew e ku civak hê jî nikare di warê karê van rêxistinên de têbighêje, hin jî dibînin ku gerdişên civakê bûne sedema nepeyda kirina encaman.

Gerdiş jinê tune dikin

Newroz dibêje: "Tu kesî dest nedaye min, ev şînbûna li ser rûyê min sedema wê ketine". Lê lêvên wê di ber gotina wê re dilerizin wekî ku dibêje, ez ne rast daxivim.

Çalakvanên ku di warê mafê jinê de kar dikin dibînin ku jina gundî hê jî tirsê xwe neşkenandî ye, vajî ya bajarî, çalakvan Mihemed Se' do yê ku di warê mafê jinê de kar dike dibêje: "Tundiya ku li gundan çêdibe paşguhkirî ye, ji ber gelek sedemên girêdayî asta hişmendiyê û ji ber ku jina gundî dibîne dema ku ew li hevjinê xwe yê ku destdirêjiyê dermafê wê dike, gilî bike, ew sînore civaka xwe derbas dike". Herweha Se' do diyar dike: "Gerdiş li gundan ji bo mêran belgeya yasakirinê ne, ji ber herdem di civaka Rojhilatî de, mêr li jinan dinêre ku ew ji bo xwarkirina igala malbatê û Eşîrê amade ye û herdem namûsa hemû kesên dora wê bi kiryarên wê ve girêdayî ne, ev yek ji berî sedên salan ve, di civakê de tê gotin"

Tundiya neşopandî

Yek ji erkên sereke yên ku rêxistinên jinan avêtine ser milên xwe, belgekirina van bînpêkirinên ku derheqê jinê de, tên kirin, Se' do derbarê vê yekê dibêje: "Bîlanço gelekî kêr innemaze li gundan, tundiya ku li gundan çêdibe bê deng e, ji ber wilo nayê belgekirin, ev tundî tê paşguhkirin, nexasim ji aliyê rêxistinên û ramanên paşketî yên dibêjin ku divabe jin lêxistinê bixwe, ev di nav civaka gundî de dibe tiştekî hetahetayî ". Herweha Se' do dibîne ku dibe sedem ji ber tundî li gor hiş û ramanên mêran tiştekî yasayî be û diyar dike ku xelkên gundan bi giştî, gelek zehmetî ji ber şoreşa Sûryayê dîtine, çî di warê civakî de û çî di warê abûrî de, dibêje: "Ev yek bûye sedema ku bi awayekî şaş, ramanên paşketî ji bo avakirina nîfşên nû bibin bingehek, tevî ku gundên herêmê ji Têknolojyayê jî bêpar nemane!".

21 jin di bin sîwana namûsê de hatine kuştin

Rêxistina Sara, yek ji rêxistinên ku di warê dijatiya tundiya li ser jinê de kar dikin, hewl dide ku hemû cureyên tundiya li herêmên kurdî belge bike, endama rêvaberiyê Muna Ebdulsalam dibêje: "Nebelgekirina tundiya li gundan, sedema wê nebîrweriya ku di civaka gundan de belav dibe, ji ber ku jin li herêmên me bi giştî û li gundan bi taybetî li dijî gilî ne, ew ji hetîketiyê û berdanê ditirsin".

Muna li ser hin çîrokên tundiya daxive û bîlanço yên ku rêxistinê belge kirine destnîşan dike û dibêje: "853 cureyên tundiya li dijî jinê, di şeş mehên pêşî de ji sala 2015an, li herêmên kurdî hatine belgekirin û berdana bê sedem -ya ku weke cureyekê ji tundiya tê binavkirin- 352 caran çêbûye".

Ne tenê berdan û lêxistin, lê Muna li ser xwekujiyê û tawanên ku di bin sîwana namûsê de tên kirin daxive û dibêje: "16 jinan li herêmên kurdî di 2015an de xwe kuştine, sedem jî ew bû ku malbat wan bê razîbûna wan dizewicînin, her weha tawanên kuştinê yên ku di bin sîwana namûsê de tên kirin, di 2015an de li Qamişloyê pir bûn û 21 jin bûne qurbaniya mejiyên paşketî".

Çivanokên civakê

Piraniya pisporan dibînin ku tirsê ji gerdişê û nerînen civakê, mafê jinê dixwe, di heman demê de jî, Newroza gundî di ber karê xwe re stranên Eyşeşanê dibêje, dibe ku nizanibe vê dengbêjê ji bo gihandina dengê xwe û ji bo bikaranîna mafê xwe, ji dayika xwe hate dûrxistin, Newroz jibîr dike ku ji hevjinê xwe re bibêje destê xwe li min hilnede, ji ber çivanokên civakê her dem ji wê re dibêjin, li kesên dora xwe nenere, bila xwarina te xweş be û bila hevjinê te razî be, ev yek bû sedem ku ew jina gundî mirovahiya xwe jibîr bike.

Zimanê Me Dibe Zimanekî Cîhanî.

Dilşad Xalid.

Salane, di her roja 27ê adarê de, ku wek roja cîhanî ya şanoyê tê naskirin, desteya navdewletî ya şanoyê, nameyekê bi boneya vê rojê belav dike, bi hezaran alavên ragihandinê li cîhanê vê nameyê diweşînin, ew destê jî nameya xwe bo bêhtirî 20 zimanan wedigerîne, lê zimanê kurdî di nav wan zimanan de tune bû.

Ebdulrehman Elî ku yek ji endamên koma Şano ye li bajarê Qamişlo, karîbû ligel hin hevalên xwe zimanê kurdî jî bixe nav wan zimanên ku nameya desteya şanoyê bo wan tê wergerandin û bo axêverên wan zimanan tê şandin.

Ebdulrehman ji kovara welat re, li ser ezmûna xwe wiha axivî: "Di cehzêrana sala 2015an de, me bangê bi zimanê Kurdî, Erebi û Ingilîzî ragihand, herweha me pêwendî girêdan bi gelek kom û kesayetiyên ku li ser asta navxweyî û cîhanî di warê şanoyê de kar dikin û wan jî piştevaniya xwe bo me diyar kir, paşê me rûpela xwe li ser Facebookê çêkir".

Ebdulrehman got: "Gelek kesayetiyên navdar li ser wê banga me imze kirin û di 15ê Sibata 2016an de, me ew bang bi listeyên imzeyan radeştî rêveberê giştî yê desteya navdewletî ya şanoyê kir".

Di roja 19ê adara 2016an de, koma Şano ya bi rêveberiya Ebdulrehman Elî karê xwe dike, kongirekî Rojnamevanî lidarxist û di wî kongirî de, mizgînî



da kurdan ku desteya navdewletî ya şanoyê, zimanê kurdî weke hemû zimanên din li xwe girt û ragihand ku aniha, em dikarin gotina roja cîhanî ya şanoyê bi zimanê kurdî bixwînin.

Beyar Xalid yek ji kesên ku guhdanê bi şanoyê dikin û karê koma Şano dişopîne, ji kovara welat re wiha axivî: "Tiştê ku birayê Ebdilrehman kir gelekî giring e, îro em dikarin bibêjin ku zimanê kurdî hêdî hêdî dibe zimanekî cîhanî û ev gaveke serkeftî ye, hêvî dikim ku herkes ji aliyê xwe ve xizmeta ziman û doza Kurdî bike".

Herweha Beyar got: "Kesên weke Ebdulrehman û hevalên xwe, ji aliyê civakê ve mafên wan wendayî ye û gerek e spasiyek bi navê hemû tevgera Kurdî ji wan re hebe û alîkarî bi wan re were kirin".

Rast e ku partiyên siyasî kurdî, ji dema damezirandina yekem partî li Rojavayê Kurdistanê, di ber zimanê Kurdî de kar dikin, lê di warê pratîkê de gaveke bi vî rengî nehatibû avêtin.

World Theatre Day, 27 March 2016
Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars 2016

Message: Anatoli Vassiliev, Russia

şanoyê ku niha gengaz in, şeweyên wê yên kevin, wê mēlag bikin ku ew pir tēn xwastin. Gerek e şeweya hozane ya şanoyê bi rengê ne asayî nakokiya netewên pêşketî neke. Niha, çanda olî her diçe lawaztir dibe, ji ber wê, ewa ku bi "zanîşwerên çandeyî" bi nav dibe, hêdî hêdî heyînin sade tēvedide û şûnê digire, lê em bi hêvî ne ku rojêkê em dişa pērgî wan werin.

Lê belê, niha ez kanim bi şeweye diyar bibînim, ku: Şano deriyê xwe bi rengê fereh vedike. Derbasbûna bēpere ji hemîyan û ji her kesekî re gerek e.

Bila amraz û kompiyoter tune bibin- tenê here şanoyê, hemî rêzikên hol pêşengehan tiji bike, gotinê bibihîse û li wēneya zindî temaşê bike! Ew şanoyê, li pêşiya te ye, jê xamsar mebe û derfeta beşdariya xwe ji dest mede- belkî ew derfeta herî giranbûha be, ku em di jiyana xwe ya lezok û bê mebest de bi

17

World Theatre Day, 27 March 2016
Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars 2016

Message: Anatoli Vassiliev, Russia

şanoyê ku niha gengaz in, şeweyên wê yên kevin, wê mēlag bikin ku ew pir tēn xwastin. Gerek e şeweya hozane ya şanoyê bi rengê ne asayî nakokiya netewên pêşketî neke. Niha, çanda olî her diçe lawaztir dibe, ji ber wê, ewa ku bi "zanîşwerên çandeyî" bi nav dibe, hêdî hêdî heyînin sade tēvedide û şûnê digire, lê em bi hêvî ne ku rojêkê em dişa pērgî wan werin.

Lê belê, niha ez kanim bi şeweye diyar bibînim, ku: Şano deriyê xwe bi rengê fereh vedike. Derbasbûna bēpere ji hemîyan û ji her kesekî re gerek e.

Bila amraz û kompiyoter tune bibin- tenê here şanoyê, hemî rêzikên hol pêşengehan tiji bike, gotinê bibihîse û li wēneya zindî temaşê bike! Ew şanoyê, li pêşiya te ye, jê xamsar mebe û derfeta beşdariya xwe ji dest mede- belkî ew derfeta herî giranbûha be, ku em di jiyana xwe ya lezok û bê mebest de bi hev re hevpar bin.

Pêdviya me bi hemî cureyan şanoyê heye. Tenê şanoyek heye, bē guman ew jî hēla kesekî de ne tē xwastin- mebesta min şanoya listokên siyasî ye, şanoya siyasî ya "neçira mişkan" e, şanoya siyasîyan, şanoya siyaseten bēber e. Tiştê ku -bēguman- daxawza me pê tune ye, şanoya tirs rojane ye- çî yekani be û çî gelekani be, tiştê ku ji me re ne gerek e şanoya laşe û xwina li kolan û meydanan e, li paytext û parêzgehan, şanoya derewin ji bo pevçûnên di navbera olan û komên nijadî de ye.

Translation into Kurdish by: Leylan ELİ

World Theatre Day, 27 March 2016
Journée Mondiale du Théâtre, 27 mars 2016

Message: Anatoli Vassiliev, Russia

ssage
fol... pêdviya me bi şanoyê heye?
wezaran şarezayên ku ji şanoyê dîsar bûne û bi milyon
ên ku di ber de westiyane vê pirsê ji xwe dikin.
o çî pêdviya me bi şanoyê heye?
tan salan de, gava ku dimenên li ser deka şanoyê bi
ia mirov û welatan re tēne rûbirûkin, ew bē sūd û bandor
ittin, û di wê demê de mera dibine, ku babelatên rastin di
a rojane de tēn listin.
ji bo me çî ye?
"gehên bi zêr xemlandî û belkonên holên şanoyê,
ekên qedîfeyî, periyên textê şanoyê yên gemarî, dengên
eran ên baş durustkirî- û berevajî wê jî- hin tiştên ku belkî
ra wan bi şeweyekî zelal xuya dibe: Sandiqên reş ku bi
owinê lekekî, ligel komek ji govdeyên tazi û hov di
i wan de ye.
e çî ji me re bēje?
?
ne her tiştî ji me re bēje.
weda li ezmên bi çî bûn, çawa girti di şikeftên
i binê zemînê de jar ketin, çawa hest kane me
û bike, çawa hezkirin kane wêranê peyda bike, çawa
û kesî bi hebûna mirovekî baş di vê cîhanê de
ra wan bi xizni destlîdar e û çawa mirov di tenetiyê de
ma ku zarok di kongehan de diçêmisin, çawa gerek
j vegerin colistanê û çawa roj li dû rojê em neçar in ji
dûrêvîn- şano kane her tiştî bēje. Şano herdem
ta dawiyê jî bimîne.
n şêst salên cûne de, û niha ji ew zor pêwîst e. Ji
te bala xwe bide hemî hunerên gelêrî, tuye yekser
i, ku tenê şano kane- gotinekê jî dēv bide dēv,
rvekî bide çavêkî, nişaneke jî destekî ta destekî, û
gundeke. Pêdviya wî bi tu navginiyê di navbera
meyr. Ew beşê herî ronîdar e ji ronahiyê, ew ne bi
Esqûr, ne Rojhilat û ne Rojava de ye- na belê ew
bi xwe ye, ji bo her çar goşeyên cîhanê ronî dide,
li her kesekî ve tē dîtîn, eger yar an neyar be ji.
şanoya ku herdem tēvel be heye, danwê
zureyên pîr û yûn.

Hevjiyana aştiyane li Tirbespiyê.

Yasmîn Hesen.



Bajarê ku pir netew yan jî pir ol be, ew bajar mîna dariştaneke ji gulên cur bi cur û rengereng xemilandî ye, lê dibe ku ev rengerengî mîna şûrekî du alî be jî, û carna erênî û carna neyînî be.

Bajarokê Tirbespiyê mîna dariştaneke ku hatiye bi gulên rengereng xemilandin, li vî bajarî pir netew, ol, ziman û bawerî peyda dibin, netewên ku li Tirbespiyê hene evin : (kurd, Ereb û Suryan) in, her netewek zimanekî xwe yî cuda heye ku jiyan xwe ya rojane bi wî zimanî bi rêve dibe, lê ev zimanê cuda nabê pirsgrêk di navbera pêkhatayan de, ji ber ku welatîyên Tirbespiyê yên ku ji nişticiyên bajêr tu pirsgrêkan di aliyê zimên de nabînin, ji ber ku ew mirov ji dehên salan v e bi hev re jiyan dikin, û mirov dikare pir kesan bibîne ku bi du zimanan yan jî bi sîsiyan daxivê, ang mirovekî kurd dikare bi zimanê Erebî û suryanî baxivê, wek nimûne mamoste (Yûsiv Amad) ku bi xwe mirovekî kurde, lê dema ku ew mamoste bi zimanê suryanî daxivê, tu nizanî ku ew kurd e, eger tu wî nasnekî, û nimûne mîna amad pirin, her wiha mamoste (Hebîb Bihno) ku ew bi xwe mirovekî suryanî ye û berî du salan derkete derveyî welêt, ew mirov bi zimanê kurdî bi kurdan re daxivê, û bi Erebî bi ereban re daxivê, nimûneyê mîna mamoste Bihno li Tirbespiyê pirin.

Her wiha mirovên Ereb yên ku bi kurdî û suryanî daxivin pirin mîna bazirganê şînahî (Ebdela) ku ji gundê (Til berhem Elxemir) e, ew mirov bi kurdî u suryanî daxive, em di karin bêjin ku piraniya xwediyên firoşgehan bi hemî zimanên pêwîst dizanin, pirsgrêka zimên di navbera pêkhatayan bajêr de ne ew pirsgrêka mezin e.

Her wiha ji aliyê olî ve jî, pir ol li Tirbespiyê henemîna (Musilman, Xirîştîyan"fileh", Êzîdî), her olek dikare bi azadî ola xwe bi rêve bibê, û tu kes astengiyên ji yên dinre

çênake, û wek nimûne Mizgefta (El rehman) û Dêra (Meryem El ezra) li di yek kolanê de ne, deriyên wan (50 î m) dûrî hev in, mirov dikare her roj dengê zingilê dêrê û banga mizgeftan li Tirbespiyê bibihîz e.

Hemû pêkhatayan bajêr di dema cejnên olî de, herwiha di dema cejnên netewî de seredana hev dikin, wek nimûne di roja jidayikbûna pêxember (Muhemed) silavên xweda lê bin, ahengek li Mizgefta Mele Ehmed hate li darxistin, di wê ahengê de keşayê dêrê amade bû û gotinek jî pêşkêşkir, di gotinaxwe de li ser biratiya gelan teqe kir.

Her wiha mirovên bajêr di dema şahî û behiyan de ew seredana hev dikin.

Hemû pêkhatayan bajêr teqez dikin ku hevjiyana aştiyane di navbera wan de çênabê tu kes pê bileyizî, ji ber ku bi nerîna wan tu kes sûdê ji têkbirina wê nabînî.

Di destpêka şoreşa Sûryê de û destpêka xwepêşandanan de gelek mirovan di got ku wê pêkhatayan bajêr li dijî hev derkevin, û gelek ezmûn çêbûn dihiştin ku mirov derbarî hevjiyana aştiyane de bitirs e, lê dema ku asta vê tirsê bilindbû komîteke ji hemî pêkhatayan bajêr hate avakirin û hemiyan cihê xwe tede girt Kurd, Ereb, Suryanî, Êzîdî), navê vê komîtê bû (komîta aştiya mirovî) ku vê komîtê karîbû destê xwe deynê ser hemî metirsiyan, hêjayî gotinê ye ku ew komît ji hin kesayetiyên serbixwe, civakî, olî, partî û niştimanî pêk dihat.

Rola vê komîtê pir mezin û giring bû di destpêka şoreşê de, ku nehişt tevlihevî çêbibe, û nehişt tu dest dirêjî bajêr bibin.

Ta vê rojê metirsî li ser hevjiyana aştiyane li Tirbespiyê tune ye, lê mirov nizane ka bê paşerojê çî ji mere veşartîye, ka bê wê çî bîne devê rîya me?. Lê ya giring ewe ku hemû pêkhatayan teqez dikin ku hevjiyana aştiyane wê berdewam bike, tu carî ew têk naçe, ji ber ku têkçûna wê dawiya jiyanê ye. ■



التنقيبات:

بدأت أولى عمليات التنقيب في التل في عام 1979 من قبل جامعة ييل الأمريكية Yale University بقياد عالم الآثار هارفي وايس Harvey Weiss عبر إجراء مسوحات وأسبار وتنقيبات في مواقع عدة من التل، وكشفت التنقيبات عن قصور ومعابد وأبنية سكنية ومخازن وفخاريات ولقى أثرية تعود لفترات مختلفة.



واجهة معبد:



تميز هذا المعبد بواجهته الطينية التي كانت تتألف من تجاور عضادات وأخاديد تفصل بينهما أعمدة زخرفية بطريقة حلزونية على شكل جذع شجرة نخيل، حيث غدت التأثيرات الجنوبية الرافدية السومرية واضحة في معالم هذا المعبد.

الرقميات:

كشفت عن 1251 رقيم مكتوب بالخط المسماري و بال لهجة الجنوبية من البابلية القديمة، تتناولت مواضيع متعلقة بالنصوص الإدارية والرسائل الملكية والمعاهدات الدولية والأمور الدينية وكذلك تناولت مواضيع اقتصادية تتعلق بإعداد شراب البيرة واستهلاكه.



شخنا - شبت إنليل (تل ليلان).

رستم عبدو.

يقع تل ليلان في الجزء الشرقي من حوض الخابور بالقرب من وادي الجراح في الجزيرة العليا. يبعد التل عن قامشلو 28 كم جنوب شرقاً وعن مدينة الحسكة 82 كم شمالاً وشرقاً.

عرفت المدينة بأسماء عدة، فقد كان اسمها القديم شخنا -Shekhna -šehna وكانت وقتها عاصمة لبلاد أبوم Apum أو أب Ap (um) التي ترددت ذكرها في أرشيف ماري (تل الحريري)، وكذلك في الرقم المسمارية المكتشفة في تل ليلان. في القرن التاسع عشر قبل الميلاد خضعت المدينة للاحتلال الآشوري وسميت شبت إنليل -šubāt -Enlil (أي مسكن الإله إنليل)، وبعد وفاة الملك شمشي أدد Shamsi Add أعيد اسمها السابق (شخنا) إليها من جديد.

يعتبر تل ليلان واحداً من أكبر التلال الأثرية في مناطق حوض الخابور وإحدى أقدم القرى والمستوطنات، حيث يعود أولى آثار الاستيطان إلى أواخر الألف السادس قبل الميلاد. كما يعتبر تل ليلان من المدن الهامة في شمال ميزوبوتاميا Mesopotamia خلال الألف الثالث والثاني قبل الميلاد وذلك لوقوعه على الطريق التجاري القديم الذي كان يربط المناطق الشمالية من سواحل المتوسط مع باقي مناطق ميزوبوتاميا وبلاد خاتيا.

يتكون التل من منطقتين (جزأين): المنطقة العلوية Acropolis وهي الأقدم والمنطقة المنخفضة المحيطة بالجزء العلوي Lower Town، تبلغ المساحة الإجمالية للتل 90 هكتاراً.

شهد التل منذ أواسط الألف الثالث قبل الميلاد ازدياداً ملحوظاً في حجم الاستيطان، فتحول من قرية صغيرة إلى حجم مدينة حيث وصل مساحتها إلى 90 هكتاراً. تطوّر تنظيمها السياسي والاقتصادي لتصبح من المراكز المهمة والاستراتيجية في منطقة حوض الخابور حملت المدينة في هذه الفترة اسم «شخنا» -Shekhna -šehna، وهذا وقد خضعت المدينة للسيطرة الأكادية خلال أواخر الألف الثالث قبل الميلاد ثم بعد ذلك للسيطرة الآشورية.

في منتصف الألف الثاني قبل الميلاد أصبحت شخنا جزءاً من الإمبراطورية الهورية الميتانية، شأنها شأن باقي مناطق حوض الخابور التي شكلت نقطة انطلاقها، وقد تمّ العثور في أماكن مختلفة من المدينة المنخفضة للتل على العديد من قبور نبلاء الميتانيين تعود لهذه الفترة، كما عثر على فخاريات ولقى أثرية متنوعة تمثل هذه الفترة.

ورشة « أنت مذيعة » بإشراف

راديو Welat FM.



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٣١) ٢٠١٦/٦/١